

Tora Rojnamevanên Kurdên Sûriyê «SKJN»

Rapora salane ji Nivîsîngeha Çavdêrî û Belgekirina Binpêkirinên di Torê de, ya sala 2022

Herêmên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê

kurteya Bikaranînê:

«Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê- **SKJN**» di raporta xwe de ku îro hat belavkirin, ragihand ku rastiya tund a binpêkirinên li dijî rojnamevan û dezgehên ragihandinê, û gelek şêweyên armanckirin û binpêkirinan, li deverên cuda yê cografî li bakurê rojhilatê Sûriyê, ku di bin kontrola aliyên cuda de ne, , nîşan dide ku hemû jî di van binpêkirinan de cih digirin.

Nivîsîngeha Çavdêrî û Belgekirina Binpêkirinan di Tora Rojnamevanên Kurd ên Sûriyê de, her sal di vê dema salê de, raporta xwe ya salane, ku tevahiya sala 2022an vedihewîne, hemû rewşên binpêkirinan li dijî rojnamevan û dezgehên ragihandinê, li herêmên kurdî bibelge dike. û yê mayî parêzgeh û bajarên bakurê Sûriyê, li rojhilatê Sûriyê, ku di bin kontrola Rêveberiya Xweseriya Demokratîk de ye, di çarçoveya rewşa Sûriyê de, heta niha nakokî di navbera aliyên nakok de berdewam in û bajarên kurdan hîn jî dagirkirî ne; ji aliyê Tirkiyê û komên çekdar ên girêdayî wê (Efrîn, Serêkaniyê / Ras al-Ain, Girê Spî / Tel Abyad), ku binpêkirinên wan ji ber reva ji dadêkirinê bittir bûne, ku karê rojnamevanan zor dijwar kiriye, û wan dixê ber metirsiyên mezin de. ji hêlekê ve li ser berdewamiya gefên Tirkiyê yê dagirkeriyên nû û hebûna bi hezaran terorîstên DAIŞ`ê ku wek bombeya demkî di navendên girtinê de ne, di gel binpêkirinên ku ji aliyê saziyên girêdayî Rêveberiya Xweser ve tên kirin ji aliyê sêyem ve; di encamê de rojnamevan neçar dimînin ku bihayên giran bidin ji ber ber karê wayî ragihandinê û pîşeyî.

Raporê 36 binpêkirinên derbarê rojnamevan û dezgehên ragihandinê piştrast dike, ku ji wan binpêkirinan 3 rewşên kuştina rojnamevanan, 9 rewşên girtinê, 2 rewşên binçavkirina demkî, 3 rewşên karbestiya demkî, 6 rewşên rêlibergirtina şopandina rojnamevanî, girtina nivîsgeha

dezgeheke ragihandinê, 3 rewşên lêdanê, 3 rewşên revandinê, birîndarbûna 3 rojnamevanan, rewşeke gefkirinê, rewşeke şkenadina camên otomobîla rojnamevanekî û rewşeke armanckirina girûpên rojnamevanî.

Her wiha Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê di raporên xwe yên salane de, piştrast dike, ku di 3 salên borî de, 50 rewşên desteserkirina samanên rojnamevanan li Efrîn, SerêKaniyê û GirêSpî ji aliyê hêzên Tirkîyê ve pêk hatine, ya ku wan deveran bi komên çekdar ên sûrî re dagir dike, û heya niha ew binpêkirin ji aliyê wan ve berdewam in.

Nivîsîngeha Çavdêrî û Belgekirina Binpêkirinan di «Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê-**SKJN**» de dibêje: “Rêjeya binpêkirinan ji sala bûrî kêmtir nebû, û ev yek jî dibe sedema tirsê bitir li ser pêşeroja azadiya ragihandinê; ji ber ku her cureyên binpêkirinan (kuştin, girtina bê sedem, windakirina bi zorê, binçavkirin û êrîşên canî, gefên sînorkirina karê wan û desteserkirina amûran û di dawiyê de jî, ku ya herî metirsîdar e, rasterast armanckirina tîmên rojnamevana ye), pêre jî sîno darkirinên li ser mafên wan, bi taybetî mafê azadiya nerînan». Toreyê di hemî rapor û daxuyaniyên xwe de amaje bi wê yekê kiriye ku «Reva ji tawanên ku li dijî rojnamevanan hatine kirin, yek ji mijarên herî giring e, ji bo garantîkirina azadiya nerînan û gihandina agahiyan, û ew bêgunehbarkirina tewanbaran, dibe sedema ku hê bêtir êrîş û kuştinan pêk bînin, li dijî rojnameger û sivîlan».

Toreyê eşkere kiriye ku çarenivîsa hevkarê wê, peyamnêrê Rûdaw TV rojnamevan Ferhad Hamo ne diyare ji 9 salan ve, ku di 15.12.2014ê de, ji aliyê terorîstên DIŞIê ve hatibû revandin, û hîn kêşeya wî ne hatiye çareserkirinê. Torê herwiha bi rêya belgeyên xwe binpêkirinên li dijî rojnamevanan li bajarên dagîrkirî, yên ku heta niha berdewam in, û yên ku bi darê zorê ji cih û warên xwe hatine koçberkirin, ku Tirkîyê û aliyên girêdayî wê ji girûpên çekdar yê rikeberên Sûriyê, dest danîne ser mal û milkên wan, hejmara wan ghiştîye 50 rûdanên binpêkirinê, li gorî belgeyên Toreyê.

Raporê herwiha şiroveyeke kurt li ser bînpêkirinên li ser asta cîhanî, û Sûriyê weke yek cografî pêşkêş kir, û komek pêşniyar ji bo dabînkirina maf û parastina rojnamevanan, û rêkarên ku ji aliyê Yekîtiya Ragihandina Azad û Dezgeha Ragihandinê ve tê xwestin, pêşkêş kir. Li gorî erkên xwe yê li gorî yasa û pîvanên navneteweyî, û rola wan di peyda kirina qadeke berfirehtir ji bo azadiya ragihandinê û ne sînordarkirina karê rojnamevanan, divê berî her tiştî rawestandina bînpêkirinan bi hevkarîya çarçoweyên ragihandinê yê serbixwe ku li herêmên Rêveberîya Xweserîya Demokratîk in.

Ji bo xwendina raportê bi tevahî, tiliya xwe li lînk **RAPORTÊ** bidin:

Rapora salane ya Nivîsgeha Çavdêrî û Belgekirina Bînpêkirinan di «Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê-SKJN» de ji bo sala 2022

Herêmên Rêveberîya Xweserîya Demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê

destpêkek:

Rojnamevan û pisporên ragihandinê li çaraliyê cîhanê dibin armanca kuştinan, girtinê, û qedexekirina kar, li gorî komît û rêxistinên navneteweyî yê ku berevaniyê di ber mafên wan de dikin, bi dehan peyamnêr û rojnamevan li herêmên şer û pevçûnan tîn kuştin, ji ber ku raporên demkî piştrast dikin ku gelek ji wan di kar de hatine armanckirin, ev hejmarên metirsîdar ji welatekî bo welatekî din cudaye, di heman demê de ew li welatekî ji devereke bo devereke din jî cûda dibin, li gorî dabeşkirina hêzên dagîker li welatên ku şer û pevçûn berdewamin, wek ku li Sûriyê ye, ku tekezî li ser giringiya pabendbûna bi biryarên girêdayî ewlekariya rojnamevanan dike, ku ji aliyê Encûmena Mafên Mirovan ve hatine wergirtin, ji ber ku parêzvanên wê hevbarin ku pêkanîna Danezana Gerdûnî hîn bêtir xewnek e ji rastiyeke; Tevî derketina Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan beriya zêdetirî 60 salan; lê belê,

hijmartinên fermî û raporên cîhanî yên ku ji hêla aliyên pispore ve hatine weşandin; Rêxistinên wekî «Peyamnêrên bê Sînor» û «Komîteya Parastina Rojnamegeran» diyar dikin ku li dijî rojnameger û saziyên ragihandinê, bînpêkirinên mezin hene, bi cureyên xwe yên cuda (kuştin, kuştina bi armanc, gefe, sirgûn, dûrxistina ne rewşa, lêdan, qedexekirina kar, bîncavkirina bê bingehek yasayî, armanckirina saziyên ragihandinê û herî dawî desteserkirina alavên ragihandinê).

Rewşa niha ya li herêmên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, pabenda bi bendên yasaya navneteweyî ya mafên mirovan, û yasaya mirovî ya navneteweyî ye, li gorî yasayên ku hikûmeta Sûriyê beriya salên şer îmze kiribûn; lewra divêt Rêveberiya Xweser pabend be bi yasa û peymanên navneteweyî li hemû herêmên di bin kontrola wê de, li her sê parêzgehên (Hesekê, Dêra Zorê, Reqayê) tevî bajarên kurdan ên li gundewarê Helebê, li gel ku rêxistinên navnetewî çî navî lê dikin bila bikin wek (Desthilatdara rewşa zor) yan jî Rêveberiya Xweser, ew kiryar û sepandinên ku dike, çî di aliyê avahiya rêveberî û rêxistinî û xizmetên ku pêşkêş dike, mîna erkên hikûmetan ne, ji ber vê yekê, rexnekirina wê di dema her bînpêkirina mafê azadiya ragihandinê de, tiştêkî surîştîye, ji ber ku ew neçar e rêz li garantiyên ku di hemû peyman û yasayên navnetewî de hene, bigire û cîbicî bike. Li vir divê bê zanîn ku hin tawanên ku li dijî rojnamevanan hatine belavkirin kirin, ji aliyê hin hêz û kesên ku bi ser Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ve, li ser bingeha şirovekirina şaş a rewşa bînpêkirinê, û bikaranîna peyvên yasayî yên dijî mafên mirovan, berî ku ew kesê li dijî wî bînpêkirin hatî kirin rojnamevan be, ji ber vê yekê, ew tawanên di heyamên sala 2022-an de, zirar da rêveberiyê, ewan dikarîbûn bi rêgezên yasayî yên eşkere û pratîk bînpêkirinan rakin ji holê, û astengiyên li ser azadiya raman û derbirînê kêm dikin.

Girîngiya Belgekirinê

Operasyonên leşkerî yên asmanî û bejayî yên Tirkiyê bû sedem ku bajarên kurdan bikevin bin kontrola dewleta Tirk a dagîrker û komên çekdar ên girêdayî wê, ku di encamê de gelek bînpêkirin li dijî

rojnamegeran pêk anîn, mal û milkên wan desteser kirin û zîyanên mewdanî di nav de, li gel zîyanên mezin di nav welatîyên herêmê de, û ev bînpêkirinên herî giran bû dema ku balafirên şer ên Tirkîyê, hem firokeyên şer û hem jî firokeyên bêfirokevan, rasterast rojnamevan kirin armanc, ku bû sedema kuştin û birîndarbûna gelek hevkarên me, çî di salên bûrî de, çî yê îsal qewimîn, ku bitir bû û berdewam kir. bînpêkirinên ji ber bêberpirsiyarî û bêtewankirinê. Ji ber vê yekê parastina rojnamevanan û berevanîkirin û pêşvebirina mafên wan yek ji armancên sereke yê Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê-**SKJN** ye, ji ber ku pabendbûna bi standardên navnewtewî ji bo parastina karkerên di warê ragihandinê de, hewldanên rêxistinên berevaniya wan lawaz dike, lewra Nivîsîngeha Belgekirin û Şopandina Bînpêkirinan di toreyê de, dîkoment dike bi şopandina bînpêkirinên ku li herêmên kurdî diqewimin, û pêşkêşkirina rastiyan û belgeyan ji rêxistinên cîhanî û raya giştî re, ji bo guhertina siyaset, kiryar û reftarên ku bînpêkirinên ji aliyê hemû aliyan ve tên kirin, karê bibelgekirina bînpêkirinên ku li Sûriyê an li her deverêkê rû didin, yek ji karên herî girîng tê dîtin ku asta azadiya çapemeniyê li ser bîngehê wê ye. Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê-**SKJN**, çendî û bi salan rewşa dijwar a bînpêkirinên li dijî rojnamevanan eşkere dike, rojnamegerî û dezgehên li herêmên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi taybetî deverên ku endamên toreyê û hevkarên wê tê de ne, diwariyek zor heye ku ji rêxistinên ragihandinî û yê mafên mirovan bigihêjinê, û karê ragihandinê pir têtê teng kirin, ji ber nasnameya cuda ya aliyên desthilatdar.

Di raporê de 36 bînpêkirinên li dijî rojnameger û saziyên ragihandinê hatine belgekirin, di nav de 3 bûyerên kuştina rojnamegeran, 9 bûyerên girtinê, 2 rewşên binçavkirina demkî, 3 rewşên rawestandina demkî ji kar, 6 bûyerên astengkirina karê ragihandinê û girtina dezgehek ragihandinê, û sê rûdanên lêdanê, sê bûyerên revandinê, sê rojnamevan birîndar bûn, bûyerek gefxwarinê, yek rûdana şikandina cama Otomobîla rojnamevanekî, û yek bûyer jî armanckirina xebatkarên ragihandinê. Toreyê rûdana êrîşên asmanî bi firokeyên şer û firokeyên bêfirokevan belge kir, yan jî armanckirina tîmên ragihandinê bi mûşek û topan ji aliyê artêşa Tirkîyê ve, ku sê bajarên Kurdan li Sûriyê dagîr kiriye, (Efrîn, Serêkaniyê/Res al-Ain, Girê Spî/Tel Abyad).

Nivîsgeha Belgekirina Binpêkirinan, li gorî xebatên xwe yên salên bûrî, xwendinek berferêh kiriye ji hemî dxuyanî û daxwaznameyên ku hatine belavkirin, çî ji aliyê Dezgeha Ragihandinê û çî ji aliyên Yekîtiyên Ragihandinan yên girêdayî Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ve, têkildarî hin binpêkirinên ku rûdane, û rola wan di kêmkirina Binpêkirinan de, yan jî azadkirina hinek girtiyên ku ji bo heyamên diyarkirî, bi awayekî bêguneh û neyasayî, bêyî sûcên fermî û li derveyî kiryarên dadwerî.

Toreyê herwiha dide zanîn ku ti pêşketin di dosya binpêkirinên li dijî hevkarên rojnamevan û xebatkarên medyayê yên ku bi darê zorê ji bajarên xwe koçber bûne, û milkên wan hatine desteserkirin, çênebûye, ku ev yek di çarçoveya plana toreyê ya belgekirina binpêkirinên salane de ye, ku ji wan cuda ye, ji çarçoveyên din yên berevaniyê li mafên rojnamevanan dikin, û azadiya karê ragihandinê, nemaze ji ber ku aloziya Sûriyê hîn berdewam e, û hîn bajarên kurdî ji aliyê Tirkiyê û komên çekdar ên girêdayî wê ve hatine dagîrkirin, û tevî doza me li ser mafan ku bi demê ne nayên ketin, ji ber bêgunehkirina Tirkiyê, ew jê re bo alîkarî wê kir ku di binpêkirinên xwe de berdewam bike der mafê hemiyar, nemaze yên ku di ragihandinê de dixebitin da ku rastiyê veşêrin; rêjeya bêgunehkarkirinê asta cîhanî de bilind de, li gorî Rêxistina Neteweyên Yekbûyî yên Perwerde, Zanist û Çandê ya, û UNESCO, û rêjeya wê digihêje %86'ê di navbera salên 2020-2021'an de, li gorî rapora rêxistina «Peyamnêrên Bêsînor».

Nivîskarên raporê

Nivîsgeha Belgekirin û Çavdêriya Binpêkirinan girêdayî «Toreya Rojnamevanên Kurd a Sûriyê-**SKJN**» ye, çarçoveyeke Rojnamevanan ku serbixwe ye, armanca wê parastina azadiya ragihandinê li herêmên hebûna xwe, dûrî celeb, ol, nijad, an saziyên ku tê de kar dikin, an aliyê aliyên gunegkar. Ew di nav rêzên xwe de pisporên ragihandinê yên kurdên Sûriyê û rojnamevanên ji pêkhatiyên din li hundir û derveyî Sûriyê.

Tora di 10ê Adara 2012an de hat damezrandin, dema ku di destpêkê de navê «Yekîtiya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê-YRK.S» bû, piştî komê rojnamevanên kurd yê derçûyên zanîngeha ragihandinê ya Şamê, biryar dan: ji bo pêdiviya pêşvebirina rewşa medyaya kurdî, bi guftûgokirina rewşa Sûriyê bi giştî û ya, û ya kurdî bi taybetî, bi bêalîbûn û bi pêşezazî, dûrî her layingeriyeke siyasî û partiyetî. Li ser biryarên Kongireya Çaremîn a ku di 8ê Tebaxa 2020an de bi erêkirina piraniya endaman hat lidarxistin, navê ji «Yekîtiya-YRKS» bû «Tore-SKJN». Tore di rapora xwe ya salane, pişrast dike li ser devê endamên wê ku li herêmên cuda belav in, bi rêya pîvanên taybet li gor yasa û normên navdewletî yê girêdayî parastina rojnamevanan, yê ku ji aliyên cihê yê şerê Sûriyê ve, û aliyên din û aliyên derveyê wê tên kirin. Ji bilî nûçe û raporên ragihandinê yê ku di dema bînpêkirinê de ji aliyê dezgehên ragihandinê yê herêmî û navendên çavdêrîkirin û belgekirina bînpêkirinan ve hatine weşandin, piştî ku bi hemû pisporî û hûrgulî vekolîn û verastkirina wan dibe, û li ser gotinên rojnamevanê ku rastî Bînpêkirinê hatiye.

Bi salan e, nivîsgehê erk girtiye ser milê xwe ku bi awayekî bêalî û serbixwe berevaniya azadiya rojnamevanîyê bike, ji bo parastina mafên wan, û bi rêxistin û sazîyên navnetewî re têkildar, ji bo gunehkirina bînpêker û tawankaran re, ji bo bidestxistina dademendiyê di sîbera ragihandinek azad û pîşeyî de, nemaze ku hejmarên salên bûrî piştrast dikin ku bînpêkirin bi operasyonên leşkerî re qat bi qat bitir dibin, ji ber ragihandina meydanî ya medyayê li ser erdê ji aliyekî ve, û xwepêşandan û rûniştinên şermezarkirina wan ji aliyekî din ve, ku rê li ber ragihandinê tê girtin, di piraniya rewşan de, nexasim bînpêkirinên din ên ku berovajî azadiya raman û derbirînê ne, û li dijî mafên ku yasayên navnetewî di vî warî de ji bo pisporên medyayê li seranserê cîhanê naskirî ne, wek girtin, binçavkirin, lêdan, û desteserkirina alavên ragihandinê.

bînpêkirinên li ser asta cîhanê

Li gor raporta salane ya rêxistina «Peyamnêrên Bêsînor» ku li cîhanê belav bûye, rêjeyeke bilindî nû di hejmara rojnamevanên girtî de hatiye tomarkirin, û bînpêkirinên li dijî wan hatine kirin, ji ber ku hejmara

girtiyên di nav karkirên ragihandinê de gihîştîye 533 rûdanan, di sala 2022'an de, 57 rojnameger hatin kuştin, di vê kategoriyê jimara rojnamegeran hatin kuştin, carek din bilind dibe. Rêxistinê her wiha herî kêm 65 girtî û 49 rojnamevanên wînda jî belge kirine, rêjeya ku par hatibû tomakirin derbaskir, heta 1ê Berçîle ya 2022an bi kêmî 533 rojnamegeran girtî bûn, li gorî sala bûrî 13,4% bitir bû. «Peyamnêrên Bêşînor» di sala 2022an de jî rekorek din tomar kir, ku niha 78 rojnamevanên jin li pişt hesinên zindanan ne, rêjeye rojnamevanên jin yê girtî 30% ji rêjeya sala bûrî, bitire, û diyar kir ku jin aniha %15ê giştîya rojnamegerên girtî ne, lê ev rêje berî 5 salan %7.

Rêxistinê di raporta xwe de amaje bi wê yekê kir ku rejîmên dîktator û stemkar, dikin daku zindanan xwe bi rêjeyeke bilez tijî bikin ji rojnamevanan re, ji ber ku ev hijmara bilindî nû ya rojnamevanên girtî tekez dike ku pêwîstiya lezgîn bi rawestana li hember desthilatên bêwijdan û nîşandana hevkarîyeke bi bandor bi ragirê mûma azadiya ragihandinê, serbixwebûn û pirhijmariya ramanan. «Peyamnêrên Bêşînor» tekez kir ku ji sala 1995an ve ew raportek li ser bînpêkirinên ku li dijî rojnamevanan hatine kirin, li ser bingeha daneyên rast ên ku di tevahiya salê de hatine berhev kirin, diweşîne, ji ber ku rêxistin bi baldarî zanyariyên piştrast dike, bi kêmanî bi hûrguliek pir xurt, girtina rojnamevan an alîkarên medyayê yê têkildar, an jî revandin an windakirina wan, rasterast encama çalakiyên wan yê ragihandinê ye.

Li ser asta Sûriyê

Hejmara bînpêkirinan li herêma erdnîgariya Sûriyê li gorî salên bûrî kêm bûye, û ev kêmbûn bi sedema rawestandina tundiya şer û pevçûnan di navbera aliyên nakok de ji aliyekî ve, û kêmbûna rêjeya girtin û kuştina rojnamevanan di bin eşkenceyê de di zindan û girtîgehên rejîmê de li hêleke din, ji ber ku şer di navbera rejîmê û rikeberiyê de berdewam bû, û rêxistinên tundrew yek ji sedemên sereke yê zêdebûna hejmara bînpêkirinên di salên bûrî de, û li gorî raporên demkî yê «Navenda Sûrî ya Azadiyên Rojnamevanan», ku ser bi «Komeleya Rojnamevanên Sûriyê-SJA» ve ye, hejmara bînpêkirinên di sala 2022an de gihîştîye 54

binpêkirinan, di heman demê de hejmara giştî ya binpêkirinên ku ji sala 2011an ve hatine belgekirin, ji destpêka xwenîşandanan Tevgera gel a aştiyane 1475 binpêkirin tomar kirin, ev hejmar matmayî ye ku Sûriyê di nav welatên ku herî bitir rojnamevan tê de hatine kuştin, li deverên nakok ên berê, di heman demê de ku ew nema di nav welatên herî metirsîdar de bû di salên 2021-2022an de, lê dîsa jî, ev kêmbûn dîse jî Sûriyê dimîne di nav sêyemîn dewletên metirsîdar de, heger em rojnamevanên ku hatine kuştin berî van herdû salan, her çend êrîşên herî giran bi awayekî berçav di serdema salên 2012-2013'an de, yanî di destpêka şer de ku xwepêşandanên aştiyane veguherî leşkerkirinê û piştî jî di navbera salên 2014-2015'an de bi derketina rêxistinên "DAIŞ û Cebhet El-Nusra" re. hêj hejmar ji rastiye kêmtir in, ji ber ku hejmarek ji rojnamevanan winda ne, piştî ku ji aliyê hêzên ser bi hikûmeta Sûriyê ve hatin girtin, an piştî ku ji aliyê DAIŞê ve hatin revandin, û di nebûna belgeyên mirinê de, gelek malbat hîn jî hêvî dikin ku ew sax bin, tevî bi salan revandin û rastî îşkenceyên herî xerab hatine, li vir divê bê zanîn ku piraniya rojnamevanên ku hatine kuştin, %65ê wan, bi armanckirinê û rasterast hatine kûştin, ji bo rakirina wan ji holê.

Bi kêmbûna tundiya şer li parêzgehên cuda yên Sûriyê re, komên çekdar ên girêdayî Tirkîyê yên bi navê «Artêşa Niştimanî ya Sûriyê» ji ber binpêkirinên ku li herêmên bakurê rojhilatê Sûriyê bi giştî, û bi taybetî bajarên ku ji aliyê Tirkîyê ve hatine dagirkirin (Efrîn, Serêkaniyê/Ras al-Ain, Girê Spî/Tal Abyad) û ev hejmar û tiştên ku qewimîn - û diqewimin - hişt ku Sûriyê di rêza 171-an de di pileyaa cîhanê de ya azadiya ragihandinê bimîne, ya ku ji aliyê rêxistina «Peyamnêrên Bêsînor» ve di nivê salê de, weşan dibû.

Binpêkirinên li herêmên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk

Nivîsgeha Belgekirina Binpêkirinan ya Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê-**SKJN** 36 rûdanên binpêkirinan di sala 2022an de dîkoment kirine, ku li bajarên piraniya wan Kurd in û deverên din ên bakurê rojhilatê Sûriyê yên di bin kontrola Hêzên Sûriya Demokratîk de, û herwiha li bajarên Kurdî yên ku di bin kontrola dagirkeriya Tirkîyê û komên çekdar

ên ser bi wê ve, ji bilî rûdana sê binpêkirinên li derveyî erdnîgariya Sûriyê.

- 1- **Dezgeha Ragihandinê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, wênegir û rojnamevanê «AFP» Delîl Silêman 70 rojî ji kar dûr xist, ji 9ê Çileyê 2022an ve bi mehna bikaranîna Dronê ji bo kişandina wêneyên kampa "Sehlet el-Banat" li Reqa bêyî ku destûr werbigire.**
- 2- **Nûçegihanê «Yekiti Media» Jîndar Berekat, sibeha roja sêşemê 18ê Çileyê 2022an, hate revandin ji dikana wî ya li taxa El-Muftî li bajarê Heskê li Bakurê Sûriyê, ji aliyê komeke rûpêçayî ve, ku li Cêbeka bê nemra siwarbûn, û paşî çend katjimêran vegeriya, ku rastî lêdan û destdirêjîyê hatibû, û tiliyek wî hat şikandin, telefona wî û perê wî jî bi zorê jê standibûn.**
- 3- **Berpirsekî dewriyeyê di hêzên Ewlekariya Hundirîn de li taxa «Halko» ya bajarê Qamişlo li bakurê Sûriyê, roja sêşemê 18.01.2022ê rojnamevan Beşar Idrîs Xelîl, peyamnêrê radyoya «ARTA»yê, dema ku amadebû li ser rêya Kornîşê di gireva xwediyan Taksiyan, ku daxwaza zêdekirina nirxê guhestina siwaran dikirin, dest danîn ser têlefûna wî û li nêzîkî cihê girevê rawestandibû, da ku paşê li heman cihî berdin û têlefûna wî jî lê vegerandin.**
- 4- **Nûçegihanê ajansa «Hawar»ê, Basil Reşîd piştî ku di 21ê Çileyê 2022an de dema ku nûçe dişopand li derdora zindana El-Sînaa li taxa Gwêran a bajarê Heskê, di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk û rêxistina bi navê Dewleta Îslamî li Iraq û Şamê (DAIŞ), bû armanca çekdarên DAIŞê û birîndar bû, bi du guleyan yek li sînga wî ket û ya din zik de; di dema girtiyên terorîst yê wê rêxistinê girev kirin, ligel êrîşa şaneyên razayî yên wê rêxistinê..**
- 5- **Rêveberê Navenda Ragihandinê ya Encûmena Leşkerî ya Suryaniyan Fayîz El-Emleh di 21'ê Çileyê 2022'an de dema ku bûyerên li derdora Zindana El-Sînaa li taxa Gwêran a bajarê Heskê dişopand, bû armanca sekvanekî DAIŞê ji destên xwe birîndar bû.**

6- Wênegirê nivîsgehaa Ragihandinê ya Erka Xweparastinê Ehmed El-Nasir dema ku şer û pevçûnên di navbera Hêzên Sûriyeya Demokratîk û rêxistina bi navê "DAIŞ"ê de li derdora zindana El-Sînaa dişopand, hat kuştin, li taxa Gwêran a bajarê Heseke.

Rojnamevanê bi navê Baran Mihemed got, ku ew bi hevkarê xwe Ehmed El-Nasir re li ser avahiya Banka Bazirganî bû, dema ku birîndarbû bi guleya sekvanekî «DAIŞ»ê li ser avahiya Koleja Endezyariya Sivîl a li nêzî Zindana Sînaa.

7- Şaneyên razayî yê girêdayî rêxistina bi navê Dewleta Îslamî li Iraq û Şamê (DAIŞ), tîmên ragihandinê yê ku bûyerên zindana Guwêran dişopandin kirin armanc, piştî ku Hêzên Sûriya Demokratîk bi temamî kontrola zindana El-Sînaa ragihand, û ew tîmên ragihandinê girêdayî van kanalên bûn: (Sky News Arabia, Al Arabiya, Kanala El-Aan, Kanala El-Ghad), ku ji aliyê Hêzên Sûriyeya Demokratîk ve hatibûn parastin.

8- Tîma Tora Medyayî ya «Rûdaw»ê ku ji (Vîviyan Fetah, Barzan Ferman, Îsa Xelef, Ara Pîjo) pêk dihat, ji aliyê Hêzên Ewlekariya Hundirîn ve, rê li ber wan hat girtin ku şopandina şer û pevçûnên di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk û çekdarên «DAIŞ»ê de li derdora zindana Sînaa li bajarê Heseke bikin, û ew ji bajêr hatin derxistin, û navên wan li ser xalên pişkinî li deriyên bajêr hatin danîn da ku careke din venegerin wî bajarî.

9- Roja Çarşemî 02.02.2022ê, grûpeke asayîşê, rê neda ku peyamnêra Tora Medyayî ya «Rûdaw»ê Vîviyan Fetah karê xwe bike û bi awayekî bêrêzî birin navenda asayîşa navxwe, ya bajarê Qamişlo, û nasnameya wê jê standin, di dema merasîma veşartina 12 şehîdên Hêzên Sûriya Demokratîk li goristana şehîdan li bajarê Qamişlo, û di heman rojê de hat berdan li gel lêborîna hevserokatiya navendê ji ber wan kiryarên nebaş derheqê wê de, lê nasnameya wê nehate vegerandin heta amadekirina vê raportê, weke ku ji aliyê peyamnêrê Vîviyan ve hatiye piştrastkirin.

10-5-Pênc kesan destdirêjî li kameramanê tora nûçeyan a «Rûdaw»ê Îsa Xelef û şofêrê wê Ebdullah Mejdal kirin, piştî ku ew birin cihekî derveyî Qamişlo, û dest danîn ser kamera û alava weşana zindî ya Toreyê, piştê jî ew serbest berdan, lê ew rastî destdirêjî û lêdanê û gefekirinê bûbûn. Di dema merasîma veşartina 12 şehîdan de, li goristana şehîdan a Qamişlo, di 02.02.2022an de. Wênegir destnîşan kir ku êrîskar ne endamên hêzên ewlehiyê ne, an jî asyîşê, lê cil û bergên leşkerî li xwe kiribûn.

11-Di 5ê Sibata 2022an de, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi biryareke fermî, karê ofîsa Tora Medyayî ya «Rûdaw»ê li navçeyên xwe rawestand û erkên rojnamevaniyê ji hemû karmendên ofîsa wê ya li bajarê Qamişlo, Bakurê Sûriyê vekîşand, bi mehna ku alozî derdixin, û wêneyê saziyên ku li Bakurê Sûriyê û Rojhilatê Sûriyê kar dikin, xirab dikin.

12-Girtina rojnamevan Bawer Mele Ehmed, nûçegihanê malpera «Yekiti Media» di 5ê Sibata 2022an de, li bajarê Qamişlo, piştî çend rojan ji binçavkirinê, bêyî ku tu tawanek li ser wî were kirin, serbest hat berdan.

13-Rojnamevan Sebrî Fexrî, peyamnêrê kanala Kurdî «Ark» di 05.02.2022an de, li bajarê Qamişlo, hat girtin û ber bi cihekî nediyar ve hat birin, piştî binçavkirinê nêzîkî du meh û 10 rojan hat berdan.

14-Di 19ê Sibata 2022an de komeke rûpêç peyamnêrê berê yê kanala kurdî «Ark»ê Ehmed Sofî ji mala wî li bajarê Dêrikê revandin, û malbata wî nekarîn nedizanî çarenivîsa wî û cihê wî û sedema girtinê, heta serbestberdana wî, piştî nêzîkî du mehan.

15-Komeke rûgirtî rojnamevanê berê yê kenalê «Ark»ê Dara Abdo, roja 19.02.2022ê, ji bajarê Heskê revandin û ber bi cihekî nediyar ve birin, û malbata wî jî nedizanî cihê ragirtina wî, ji ber ku ti dezgeheke asayîşê ya bi ser bi Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ve desteserkirina wî ne ragihand, heta serbestberdana wî nêzîkî du mehan.

16-Di 10ê Gulana 2022an de, polîsên leşkerî yê çekdarên alîgirên Tirkîyê, çalakvanê medyayî Mehmûd Mihemed Xêr Fewaz, ku bi navê “Mehmûd El-Dimeşqî” tê naskirin, li bajarê Efrînê yê di bin dagirkeriya Tirkîyê de, binçav kirin, bi tawana rûreşkirina hinek layingirê Girûpên Çekdar li ser rûpela xwe ya facebookê, û piştê hat berdan.

17-Di 13.07.2022an de, Dezgeha Ragihandinê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, rojnamevan Hoger Mecîd ku weke pêşkêşvana bernameyan di Dezgeha «Bêjeyên welatiyan» de kar dike, ji bo heyama 36 rojan bi tawana desteser kirina endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn, carekê bi devkî bêrêzî li wan kiriye, û derbaskirina erkên xwe dûrî sinc û rewîştê rojnamevaniyê.

Rojnamevanê bi navê Hogar Mecîd got, «Di nivê tîrmeha 2022'an de li sûka Qamişlo, di navbera wî û dewriyeyê Hêzên Ewlekariya Hundirîn de şer û pevçûnek devkî rû da, û beriya wê bi çend hefteyan di navbera wî û dewriyeya şaredariyê de şerekî devkî derketibû li sûka bajêr,» anî ziman ku piştî ku di 18.08.2022an de lêborîna fermî ji Hêzên Ewlekariya Hundirîn re pêşkêş kir, ew vegehiya karê xwe.

18-Rojnamevana bi navê Menal Salih El-Mîzal ku di Komîteya Jinan a Encûmena Sivîl a Dêra Zorê de kar dike, di 15.07.2022'an de, hinan termê wê di maleke kavilkirî de li nêzî kampa «Muhemîde»- Dêra Zorê kuştî dît. Li gorî welatiyên herêmê, kuştinên bi vî rengî ji aliyê şaneyên razayî yê girêdayî DAIŞ'ê ve tên kirin.

19-Kesên nenas di 21.07.2022an de cama paşiya otomobîla rojnamevan Selam Hesên, ku li ber deriyê mala wî li bajarê Qamişlo li bakurê Sûriyê rawestiyabû, şikandin, ku ew wek peyamnêrê Malpera «El- Erebbî El-Cedîd». Çend roj beriya bûyerê, li ser otomobîlê bi tiştêkî tûj hevokên êrîşkar hatibûn nivîsandin, herwiha kameraya pişt otomobîlê jî bi qasî 3 mehan berî rûdanê hat xirabkirin û zirar dîtibû. Rojnameger rapora êrîşê pêşkêşî Hêzên Ewlekariya Hundirîn kir.

- 20-Di 30.07.2022an de, li bajarê Reqayê, li bakurê Sûriyê, hêzeke asayîşê, rojnamevan Emmar El-Xelef girt, ku bi berî girtina wî bi çend mehan li ser malpera "kelepora Feratê" dixebitî, girtina wî bi tawana ku ew kar dike ligel Dezgehên ragihandinê yên biyanî û bê ruxset li herêmên Rêveberiya Xweser li bakur û rojhilatê Sûriyê.**
- 21-Di 30.07.2022an de, asayîşa bajarê Reqayê li bakurê Sûriyê, di dema helmeteke girtina hin rojnamevanan de, bo 24 demjimêran peyamnêra ajansa «Hawar» Rûba El-Elî girt, paşê ew hat berdan.**
- 22-Di 30.07.2022an de, hêzeke asayîşê li bajarê Reqayê li bakurê Sûriyê, rojnamevan Xalid El-Hesen ku di nivîsgwha «Komîteya Ragihandinê ya Perwerdeyê» de kar dike, di nava Ençûmena Sivîl a Reqayê de, bi tawana ku Li herêmên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, bi saziyên ragihandinê yên biyanî yên bê ruxset re dixebite, û hîn jî di girtîgehê de ye.**
- 23-Di 30.07.2022an de, asayîşa bajarê Reqayê li bakurê Sûriyê, rojnamevan Bitûl El-Hesen, ku di «Koma Medyaya Ciwanan» û rêxistina «Sibe Baştir» de kar dike, 24 demjimêran binçav kir, di dema kampanyaya girtinê ya li dijî hin rojnamegeran.**
- 24-Di 30.07.2022an de, hêzeke asayîşê li bajarê Reqayê li bakurê Sûriyê rojnamevan Ebdulkerîm El-Rahil girt, bi tawana ku ew ligel dezgehên ragihandinê yên biyanî yên bê ruxset li deverên Rêveberiya Xweser kar dike, û ew hê jî girtî ye.**
- 25-Rojnamevan Barzan Ferman ku wek peyamnêrê Tora Medyayî ya «Rûdaw»ê kar dikir, roja 02.08.2022ê ji aliyê komeke rûnixumandî ve hat girtin, û bo cihekî nediyar hat veguhestin û piştî 21 rojanji girtinê hat berdan. Bo zanîna ku di dema girtina Berzan de ofîsa torê hate qedexekirin , bi biryara Desteya Ragihandinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê.**
- 26-Roja 08.05.2022ê berpirsekî hêzên Ewlekariya Hundirîn li bajarê Qamişlo/Qamişlo, rê neda rojnamevan Dara Berekat peyamnêrê**

kanala «Kurdsat News» ku bûyera teqîna bombeya gazê li nêzîkî celdeya Mounir Hebîb li bajarê Qamişlo bişopîne, û ew hat gefekirin eger ew dest ji kişandina wêneyan bernede, û jê hat xwestin ku ji cihê teqînê dûr bikeve.

27-Roja 06.08.2022ê endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn, bi lêdanê êrişî peyamnêrê ajansa «France Press»ê, wênegir Cîhad Derwîş kirin, dema ku bûyera armanckirina otombîlekê ji aliyê Balefireke Tirkiyê li herêma pîşesazî li bajarê Qamişlo dişopand, û ew ji kişandina wêneyan hat astengkirin.

28-Di 29ê Tebaxa 2022an de, rayedarên Tirkiyê rojnamevan Osman Elî girtin, û biryara dersînorkirina wî bi darê zorê dan, û nehiştin ku di bin sizaya berpirsiyariyê de di heyama ku jê re hatiye diyarkirin de, li ser axa Tirkiyê bimîne.

29-Di 19.09.2022ê de, hêzeke asayîşê li bajarê Reqayê li bakurê Sûriyê, Ammar Ebdulletîf, peyamnêrê ajansa «North Press», bi tawana ku ew ligel dezgehên ragihandinê yên biyanî yên bê ruxset li navçeyên Rêveberiya Xweser kar dike, û heta niha girtî ye.

30-Di 29.09.2022an de komek ji tevgera «Ciwanên Şoreşger» êrişî nûçegihanê ajansa Rûsî «Ruptly» rojnamevan Îvan Hesîb kirin, dema ku çalakiya rûniştinê li ber avahiya Neteweyên Yekbûyî dişopand, li bajarê Qamişlo, bi dehan şênîyên bajarê Qamişlo xwepêşandanek nerazîbûnê li dar xistin, li dijî biryara qedexekirina waneyên dewletê li dibistan û peymangehên taybet ên herêmên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk.

31-Nivîsgehê bînpêkirineke din belge kir, ya duyem li derveyî erdnîgariya Sûriyê, ku di meha Îlonê de li dijî rojnamevan Meksîm El-Îsa, peyamnêrê televizyona «El-Areby» li Almaniya, wek baregeha «Ramstein» a Amerîkî, li Almaniya, rê ne dayê ku civîna li jêr navê «Grûpa Piştgiriya Ukraynayê» bişopîne, bi behaneya ku ew bi bingeha xwe Sûrî ye, û destûr nayê dayîn ku ew bikeve baregehê, tevî şandina hemî kaxezên pişeyî û kesane

yên pêwîst wek peyamnêr, û zêdetirî 20 salan li derveyê Sûriyê rûniştiye.

- 32-Îstixbarata Tirkîyê roja 18.10.2022an rojnamevan û lêkolînerê Kurd ê Sûriyê Newaf Xelîl, ku li Almanya ye, bi gefa «kuştinê» xwar, ku ev sêyem binpêkirina li ser asta derve ye, di dema beşdarbûna wî di bernameyêke televîzyonî de, li ser kanala «El-Erebiye El-Hedath» hat weşandin, ligel lêkolînerê tirk Bakîr Atacan, ku gefa kuştinê li wî xwaribû û gotibû: «Îstixbarata Tirkîyê li ofîsa te ye, û li te temaşe dike, û dizane tu çi dibêjî û çi dikî? Û dema gerek de, dê erka xwe pêk bîne, ne niha.»
- 33-Di 11.4.2022an de, endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn li bajarê Qamişl, rê nedan peyamnêrê «Ajansê Wêneyên Çapemeniya Ewropî» Ehmed Merdelî, ku wêneyê kombûna endamên kongireya Encûmena Niştimanî ya Kurdî li bajarê Qamişlo bikişîne, li ber hola «Zana»yê ya civînan, ji ber ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn rê neda beşdarbûyan derbasî salona konferansê bibin, û erkê ragihandinê ji ser Ehmed hat kişandin nêzîkî mehekê, bi mehna wênekirina çalakiyek ku ji aliyê Hêzên Ewlekariya Hundirîn ve nehatibû destûr kirin, û piştî wê vegeriya karê xwe yê rojnamevaniyê.
- 34-Di 11.4.2022an de endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn li bajarê Qamişlo rê nedan peyamnêrê ajansa nûçeyan a Rûsiya «Ruptly» Îvan Hesîb ku dîmenê kombûna endamên kongireya Encûmena Niştimanî ya Kurd li bajarê Qamişlo bikişîne, li ber hola «Zana»yê ya civînan, ji ber ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn rê nedane beşdar bibin salona konferansê.
- 35-Di 20.11.2022an de hevkarê rojnamevan Îsam Ebdullah, peyamnêrê ajansa «Hawar»ê, piştî ku firokeyeke şer a Tirkîyê navenda elektrîkê li gundê «Teqil-Beqil» a ser bi bajarê Dêrikê kir armanc, ku rojnamevan Îsam dîmenên wêrankirinê dikişandin ku ji aliyê Tirkîyê ve hatibû bombebarankirin.
- 36-Peyamnêrê kenala «Stêrk» Mihemed Cereda, roja 20.11.2022, di encama bombebarana firokeyên şer ên Tirkîyê nexweşxaneyê

«Covid 19» li derdora bajarê Kobanî, bi çend şarapnelan birîndar bû, di dema hevkar Mihemed dîmenê wêraniya ku di encama bombebarana dewleta Tirk de li herêmê pêk hat, dikişand.

çarenûsa nenas

Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê-**SKJN**, bi mixabiniyeke kûr û bo sala nehan li ser çarenivîsa hevkarê rojnamevan «**Ferhad Hemo**» peyamnêrê kenala «Rûdaw» ku di 15.12.2014ê de ji aliyê terorîstên «DAIŞ»ê ve hatibû revandin , hîn nenas e, û dosyaya wî hîna çareserî wî li bendewariyê ye û ne diyar e, tevî têkçûna asêgehên dawî yên bi navê Dewleta Îslamî li Îraq û Şamê, li bajarokê El-Baxoz li gundewarê rojhilatê Dêre Zorê. Toreyê herwiha piştgirî da daxwaza malbata wî sala bûrî, piştî heşt salan ji revandina wî, ku tê de bang li Hêzên Sûriya Demokratîk û Hevpeymaniya Navnetewî kir, ku bi hemû hêza xwe kar bikin ji bo dîtina çarenivîsa wî û bidawîkirina vê bînpêkirina berdewam ya ku me westandîye - û malbata wî - li bendê.

Bi zorê koçkirin û desteserkirina mal û milkên rojnamegeran

Toreyê belge kir, di salên derbasbûyî de ku Tirkiyê û aliyên çekdarên rikeberên Sûriyê yên layingirê wê, bînpêkirinên li dijî rojnamevan û xebatkarên medyayê, ku bi zanebûn û bi pîlan û biryar hatine kirin, û hîn jî berdewam in, çî bi koçkirina bi darê zorê yan jî desteserkirina mal û milkan, berevajî hemî Peyam û mafên navneteweyî , mafên mirovan, lewra mijara ku vegera rojnamevanên bi darê zorê sal bi sal paşde vedikişê, di encama berdewamiya kiryarên neyasayî yên Tirkiyê û dagîrkirina çend bajarên kurdan, ku her çareseriyekê têk dide, bi piştgiriya xwe bi komên çekdar dest danîn ser mal û milkên rojnamevanan û malên malbatên wan, ev bînpêkirinên ku roleke bingehîn di nehiştina mafê gelên herêmê û pêkhateyên wê de di ewlehî û aramiyê de lîstin, wek berdewamiya bînpêkirinên li bajaran (Efrîn). Serêkaniyê / Ras al-Ain, Girê Sipî/ Tal Abyad), ew bi xwe bînpêkirina erkên yasayî yên "derew" ên Tirkiyê ne, di civîn û konferansên

navneteweyî yê li ser Sûriyê de nîşan dide, ev jî bi şiyana wê ya dewleta dagirker e û her roj bombebarankirina van deveran û gundewarên, berê deverê dide tundûtûjîyê. Ji ber ku ti aliyekî navneteweyî xwe bi berpirsyariya yasayî ya gunehkirina bînpêkeran negirtiye û ev jî bûye sedema bêgunehkirina her kesî.

Li gorî raporên salane yê Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê-**SKJN**, di salên 2019, 2020 û 2021ê de, Nivîsgeha Çavdêrî û Belgekirina Bînpêkirinan di torê de 50 rûdanên desteserkirina mal û milkên rojnamevanan ji aliyê artêşa Tirkîyê û grûpên sûrî yê girêdayî wê, belge kirine, û dosyayên desteserkirinê bi vî awayî hatin belavkirin: li herêmen Efrînê 20, Serêkaniyê / Ras al-Ain 29 û Girê Sipî/Tel Abyadê 1; ku li ser malbatên çekdaran û hin malbatên Îraqî hatin belavkirin, û emê li vir hejmara ku toreyê kariye navên wan bibelge bike û di raporên salane yê berê de biweşîne, û divê bê gotin ku hin navên wan kesên ku bi zorê hatine koçberkirin hene, me belav nekiriye ku ji tirsê li ser jiyana xizmên xwe, ji komên çekdar, û ji bo rêgirtin li dû şopandina wan ji aliyê Tirkîyê ve, û hinek ji wan kesên ku koçber bûne, li ser hinek mal û milkên wan hatine desteserkirin, û hin din me na anîne ziman bo parastina milkê mayî.

Çeteyên Sûriyê yê li ser bi Tirkîyê ve ku bi navê «Artêşa Niştimanî» dest bi ser mal û milkên piraniya rojnamevanên bajarê Serêkaniyê kirin, û ew mal û milk li ser malbatên çekdaran û hin malbatên Iraqî hatin belavkirin; Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê «SKJN» kariye navên rojnamevanên ku ji aliyê komên «Artêşa Niştimanî» ve li ser milkên wan hatine desteserkirin belge bike ev in:

- Hêza «Sultan Murad» ku yek ji pêkhatiyên (Artêşa Niştimanî) ye, di 17ê Cotmeha 2019ê de, dest danî ser mala malbata hevala rojnamevan Şêrîn Mihemed Elî Şakir li bajarê Serêkaniyê û ew veguherand baregeheke leşkerî.

- Mala rojnamevan Serdar Mele Derwîş, rêveberê giştî yê Tora Nûçeyan a «Aso».

-Mala rojnamevan Mihyeddîn Îso ku bi gelek malperên herêmî, erebî û navneteweyî re dixebite, mala wî bi amadebûna waliyê tirk ê Rihayê veguherandin dibistana ezberkirina Qur'ana pîroz.

-Mala wênekêş Rodî Se'îd, wênekêşê ajansa nûçeyan a «Reuters».

-Mala rojnamevan Abdulhelîm Silêman Abdulhelîm, peyamnêrê beşa erebî ya rojnameya «The Independent».

-Orhan Kemal, nûçegihanê malpera Yêzdîna.

-Mala rojnamevan Ala El-Rûbeyî, peyamnêra tora nûçeyan a «Aso» û sernivîserê dezgeha «Taa Merbûta».

-Mala rojnamevan Ezedîn Salih, ku berê wek peyamnêra Radyoya «Arta» kar dikir.

-Mala wênekêşê kenala «Kurdistan 24»ê Heysem Hacî, ku yekser rastî gef û xûkwaziyê hat.

-Mala rojnamevan Hesên Abdullah, ku berê wek peyamnêrê kenala «KNN» kar dikir, û piştî bi zorê penaberî Herêma Kurdistanê Iraqê bû, piştî ku hemû mal û milkên xwe ji dest dan, dema ku çekdaran dest danîn ser hemû tiştên malbata wî û beşek ji wan şewitandin.

-Mala rojnamevan Husên Zêdo, peyamnêrê berê yê «KNN» û Ajansa «North-Press», ku ew jî bi zorê penaberî Herêma Kurdistanê Iraqê bû, piştî ku grûpên çekdar dest danîn ser hemû milkên wî.

-Mala rojnamevan Hîşam Erefat, ku ji bilî karê xwe wek sernivîserê nûçeyan bi zimanê Îngilîzî di malpera «Kurdistan 24»ê de, weke kordînatore nûçeyan li gel gelek dezgehên ragihandinê yê navneteweyî kar dike.

-Mala rojnamevan Şiyar Mihemed, li Serêkaniyê, peyamnêrê kanala «Zagros», li bajarê Silêmaniyê yê Herêma Kurdistanê Iraqê.

-Mala rojnamevan Selman Manû, peyamnêrê tora nûçeyan a «Aso».

-Mala rojnamevan Alan Osman, li Serêkaniyê, ku di gelek ajansên herêmî û navneteweyî de kar dikir.

-Mala medyayê Lîloz Hekarî li Serêkaniyê, pêşkêşvana bernameyên Radyoya «WaşûKanî».

-Mala medyayê Şîra Osê, pêşkêşvana Radyoya «von FM» û peyamnêra berê ya «Rojava TV».

-Mala medyayê, Şêrîn Nû'iman, nûçegihana berê ya «ARTA FM».

-Mala Sîpan Mûsa peyamnêra «ARTA FM».

-Mala rojnamevan Nûrî Xelîl peyamnêrê beşa werzîşê ya Radyoya «ARTA FM».

-Mala medyayê ya Rodî Eyo, «ARTA FM».

-Mala wênegir Yûsif Biro.

-Mala wênegir û sînemager Azad Evdikî.

-Mala wênegir Şêx Hemo.

-Mala rojnamevan Silêman El-Tewîl, peyamnêrê kanala «Ronahî» li Serêkaniyê.

-Mala wênegir, Diyar Mi'io.

-Komên sûrî yên ser bi Enqereyê dest danî ser mal û milkên piraniya rojnamevanên radyoya «Waşûkanî».

- Çeteyên «Artêşa Niştimanî» dest danî ser mala hevkarê me Ridwan Reşîd Osman, (Redwan Bêzar) û mala malbata wî li bajarê Girê Spî û maleke wanî din li gundê «Sûsik»ê û veguhetin navendeke leşkerî; Rojnamevan Ridwan Bêzar di kanala «Kurdistan 24»ê de karê rojnamevaniyê dike û ji ber karê xwe yê rojnamevaniyê çendîn caran gefên kuştinê li wî hatibûn xwarin.

- Di 10/10/2019 de li gundê El-Dadodiya yê ser bi bajarê Serêkaniyê, desteserkirina mala hevkarê me Selman Selman endamê Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê û bi zorê û malbata wî koçberkirin, ji aliyê komên çekdar ên girêdayî dewleta Tirk ve.

Berdewamiya koçkirina bi darê zorê di bin gefa girtin û kuştinê de ji aliyê komên “Artêşa Niştimanî ya Sûriyê” ku bajarê Efrînê dagîr kirine ji bo hevkarên jêrîn:

-Koçberkirina bi darê zorê ya rojnamevan Mihemed Belo, peyamnêrê berê yê kanala satelîtê ya «Kurdistan 24» û radyoya «Rozana», ji ber gefên çekdaran û desteserkirina mala wî li Efrînê, û berdewamiya gefên kûştinê ji alavên têkildariya Ilîkitronî yên Tirkî.

-Berdewamiya koçkirina bi darê zorê ya rojnamevan Cîhad Ebdo, peyamnêrê ajansa «Hawar»ê ji Efrînê, piştî ku jiyana wî di metirsiyê de bû.

-Veguhestina bi zorê ya rojnamevan Roj Mûsa, peyamnêrê ajansa «Hawarê, piştî gefên endamên çekdaran berdewam bû.

-Veguhestina bi zorê ya rojnamevan Newroz Reşo, peyamnêra «Dengê Amerîka» û peyamnêrê kanala «El-Hurra» ya Amerîkî, piştî gefxwarin lê hat kirin.

- Berdewamiya koçkirina bi darê zorê ya rojnamevan Ehmed Katma, peyamnêrê berê yê ajansa «SMART»ê bo Kurdistana Iraqê, ji ber ku ew gef ji aliyê çekdarên grûpên leşkerî yên bi Enqerê ve girêdayî.

-Berdewamiya veguhestina bi zorê ya rojnamevan Ehmed Şefîe Bîlal ku bi ajanseke nûçeyan a Rûsî re dixebitî.

-Berdewamiya koçkirina bi darê zorê ya rojnamevan Nûrhat Hesên peyamnêrê ajansa «Hawar»ê.

-Berdewamiya koçkirina bi darê zorê ya rojnamevan Sîdo Îbo, peyamnêrê ajansa «Hawar»ê.

-Berdewamiya koçkirina bi darê zorê ya rojnamevan Mizgîn korsiyê, peyamnêra kenala «Ronahî» û desteserkirina mala wê li bajarê Efrînê.

-Berdewamiya koçkirina bi darê zorê ya rojnamevan Cafer Ce'efo, peyamnêrê ajansa «Hawar»ê û desteserkirina mala wî ji aliyê hin nişteciyan ve.

-Berdewamiya koçkirina bi darê zorê ya rojnamevan Tîrast Cûdî, peyamnêrê ajansa «Hawar»ê û desteserkirina mala wî ji aliyê çekdaran ve.

-Berdewamiya koçkirina bi darê zorê ya rojnamevan Mûnzir Şêxo, peyamnêrê berê yê kanala «Ronahî», û desteserkirina mala wî ji aliyê çekdaran ve.

-Berdewamiya koçkirina bi zorê ya rojnamevan Memo Hesên ku berê di rojnameya «Ronahî» de dixebitî.

-Berdewam koçkirina bi zorê ya rojnamevan Selah Îbo ku berê di rojnameya «Ronahî» de dixebitî.

-Berdewamiya koçkirina bi darê zorê ya rojnamevan Jiyân Hacî ku berê di Ajansa «Hawarê» de kar dikir û niha di nav Tora Medyayî ya «Rûdaw»ê de ye.

-Koçkirina bi darê zorê ya rojnameger Idrîs Henan, ku hîn di Rojnameya «Ronahî» de dixebite.

-Berdewamiya koçkirina bi darê zorê ya rojnamevan Hesên Tehsîn Nasir ku berê di rojnameya «Ronahî» de dixebitî.

-Berdewamiya koçberkirina bi darê zorê ya wênegir Zekerîya Şêxo ku di kanala «Ronahî» wek wênekêş kar dike.

-Koçberkirina bi darê zorê ya rojnamevan Şerîf Mihemed berdewame, ku berê di kanala «Ronahî» de dixebitî.

- Berdewamiya koçberkirina bi darê zorê ya rojnamevan Hesên Qoşo yê bi «Rojava TV» re dixebite.

Li gorî qanûnên navneteweyî parastin

Piştî derbasbûna 11 salan, rojnamevan û dezgehên ragihandinê hîn rasterast - û nerasterast - tînin armanckirin, wek beşek ji hewildanên wan ji bo ragihandina rastiyê û belgekirina tawanên ku li dijî sivîlan hatine kirin, tevî hin hewildanên reşkirina medyayê, li cîhanê, herêma û deverê. wek ku bi êrîşên Tirkiyê yê wê dawiyê re rû da û tê de rojnamevanek hat kuştin, yek jî rasterast birîndar bû, bêyî ku bala wan li ser wê yekê hebe ku ew wek sivîl li gorî yasaya mirovî ya navnetewî, û ew di bin parastinê de ne, û her êrîşek li dijî wan dibê ku bibe tawanên şer, wek ku Neteweyên Yekbûyî her sal diruşmeke nû ji bo parastina rojnamevanan bilind dike, di dema ku ew roja cîhanî ya bidawîanîna bêgunehkirina tawanên ku li dijî rojnamevanan hatine encamdan, ku dikeve 2ê Mijdara her sal, ev roj wekî piştrastiyek eşkere tê binavkirin, ku ewlehiya rojnamevanan li ser Serê lîsta mijarên mafên mirovan û giringîdan bi rola

wan a mezin û jiyânî di eşkerekirina rastiyê de, berpirsiyar girtina aliyên şer û dadgehkirina wan ji ber karên ku kirine, li dijî dezgehên ragihandinê û navendên wan, ev bînpêkirineke eşkere ye ji xala 19ê ya Rapora Mafên Mirovan a Navnetewî di mercên aştiyane de, ku dibêje «mafê her mirovî heye ku her tiştê ew dixwaze bê astengî hembêz bike, û her kes xwedî mafê azadiya derbirînê ye, û ev maf azadiya wî heye ku li cûrbecûr agahdarî û ramanan bigere û wan bi her şeweyî werbigire û bide kesên din, û bi her awayê ku ew hildibijêre, û bêyî berçavgirtina sînoran», ji bilî vê yekê ku ev yek bînpêkirinek eşkere ye ji prensîbên xala 79 ji protokola zêde ya peymanên Cenêvê yên 1949 ya mafê mirovî ya navneteweyî de, û biryara 1738 ya Encûmen Ewlekariya Neteweyên Yekbûyî, ku dibêje ku «rojnamevan û peyamnêr sivîl in, divêt rêz û parastina wan bê girtin, û navend û alavên ragihandinê wekî tiştên sivîl têne naskirinê, nabe ku bibin armanca êrîşan an Kiryarên heyfê».

Li ser bingeha van yasayan, Nivîsgeha Belgekirinê ya Tora Rojnamevanên Kurdên Sûriyê-**SKJN**, ji destpêka damezrandina xwe ve, hemû bînpêkirinên ku di navbera (kuştin bi armanc, kuştin, girtin, biçavkirin, gef, sirgûn, derkirin û sirgûnkirina bi zorê, lêdan, qedexekirina kar, biçavkirinê bê bingeheke yasayî, armanckirina dezgehên ragihandinê, û di dawiyê de desteserkirina alavên ragihandinê), ev binavkirin ku li piraniya navendên çavdêriya bînpêkirinan li cîhanê hatiye pejirandin, di heman demê de doza Sûriyê jî taybet e xwe heye, ew jî bi koçberkirin û penaberkirina bi zorê ya rojnamevanan, û desteserkirina milkê pisporên medyayê ji aliyê komên çekdar ên Sûriyê yên ser bi Enqerê ve. Ji ber vê yekê toreyê herdem daxwaza sepandina yasayên navnetewî yên girêdayî karê rojnamevanî di dema pevçûnan de dike, û daxwaza alîkariyê ji yasaya Roma ya Dadgeha Tawanan a Navnetewî dike, ku li gorî wê tawanên li dijî sivîl û kesayetiyên, ku baregehên medya jî di nav de ye, li gor bendên heft û heştan wek tawanên şer û tawanên dijî mirovatiyê tên hesabandin. Ev yasa dabînkirina maf û ewlekariya rojnamevanan misoger dikin, û rê li ber her şeweyên tundûtûjiyê li dijî wan digrin, di heman demê de rê dide wan ku bigihîjin agahiyan, di çarçoveya mafê xwe yê azadiya raman û derbirînê de, bi her awayê ku ew hilbijêrin weşanê bikin, û li gorî wan ew tevgera xwe bikin bê astengî ji wan re bête dayîn, ev mafên han dikevin bin azadiya karê rojnamevaniyê de.

Pêşniyarên

Girîngiya azadiya ragihandinê û azadiya raman û derbirînê ji wê yekê tê, ku ew mafên bingehîn ên mirovî ne, û dema ku em pabendbûna bi wan re piştrast dikin, ji ber ku girîngî em wan her dem bi kar bînin, ji ber vê yekê pênaseya azadiya ragihandinê, ji hêla Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî dibêje «mafê belavkirina agahdarî û ramanan bi serbestî, bêyî astengî, berevajîkirin an sîno-darkirina rayedaran. Lê di heman demê de, divê medya bêalî û rast bimîne. Dema ragihandin azad be hem demokrasiyê diparêze hem jî welatîyan diparêze». Tevî ku azadiya ragihandinê di warên rêveberiya xweseriya demokratîk de li gorî qadên din ên kontrolê, çî ji aliyê rejîmê û çî ji aliyê opozisyonê ve bi hemû navên xwe, baştir tê cîbicîkirin, lê dîsa jî daxwazên rojnamevanên pispor û saziyên wan pêk nayîne.

Ev hemû pêwîstî bi pêşxistina mekanîzmayên bibandortir ji bo parastina rojnamevanan dike, ya herî sereke avakirina komîteyek e ku nûnerên sendîka û komeleyên ragihandinê, nûnerên saziyên medyayê yên sereke û civaka sivîl, di nav bingeh û mercên ku li ser lihevkarîna hemî aliyên beşdar, ji bo ku kar û pêşniyarên xwe bi cih bîne, bi awayekî serbixwe û bê zor, da ku pêvajoya «dadkirina rojnamevanan» di derbarê her şaşîtiyeke «texmîn kirî» de ji sincê pîşeya ragihandinê re ji pisporan re were hiştin, ji vê komîteyê de di serî de, dûr ji her alîyekî ji derveyî çarçoveya dezgehên ragihandinê û dezgehên ewlekarî yên din, û ji bo bihêzkirina rêzîknameya rojnamevanî ji bo sincê pîşeya ragihandinê. Dibe ku girîngtirîn pêşniyarên di vî warê de ew be ku di dema nirxandina binpêkirinên ku hatine kirin an bi azadiya derbirînê ve girêdayî ne, xwe bispêrin biryar û yasayên din ji bilî yasaya Ragihandinê, û di çarçoveya vê pêşniyarê de pêdivîya rakirina «agahdariyên devkî» ji aliyê Dezgeha Ragihandinê ve ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, yên girêdayî bi pêwîstiya endametiya Yekîtiya Ragihandina Azad re, ji bo ku karibe karê xwe yê rojnamevaniyê bike - tevî ku peywireke ragihandinê ya rojnamevanî heye ku destûrê dide wî ku kar bike - li gorî rêgezên azadiya ragihandinê, û ya duwem, ji ber bikaranîna mafê azadiya raman û derbirînê, yan jî mafê wan yê gihandina agahiyan, dawî li dadkirina rojnamevanan bînin, û

bêyî belgeyên tund doz li wan bê vekirin, û ya sêyem, em dawî li girtina her kesê rojnamevan tînin, tenê ji bo bikaranîna mafê xwe yê berevanîkirinê, ku karê wan asteng dike û mafên wan ên bingehîn bînpê dike. Ji ber vê yekê, Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê-**SKJN** dê berdewam be ji bo çavdêrîkirin û belgekirina bînpêkirinên ku li dijî rojnamevanan tên kirin, çî bi rêya daxuyanî, ronîkirin, dorname, raporên salane û pêşkêşkirina pêşniyarên pêwîst ji rayedarên pêwendîdar re li herêmen Rêveberiya Xweser li bakurê rojhilatê Sûriyê, ku girêdayî erkên wan û pejrandinên li gor yasa û pîvanên navnetewî, ji bo misogerkirina parastina rojnamevan û parêzvanên mafên mirovan, û parastina wan ji bo cîbicîkirina kar û erkên xwe, li dijî kiryarên tirsandinê, êrîş, biçavkirina nerewa, desteserkirina amûran, û bînpêkirinên din tevî biçûkbûn û bandora wan, ji nik aliyên cihê şer ve hatine kirin.

Tora Rojnamevanên Kurdên Sûriyê

Nivîsgeha Şopandina Bînpêkirin û Belgekirinê

Qamişlo: 16 Çile 2023